







## Mentoring-Programm von kein Abseits! e.V.
## Programa Fêrxwazî ya komeleya kein Abseits! e.V.

### Informationen für Eltern
### Enforamasyon ji bo Dê û Bav

**Dêûbav û Weliyên qanûnî ên delal, Zarokên delal,**

em dixwazin bi kêfxweşî Programa Fêrxwazî ya komeleya kein Abseits! e.V. bi we bidin nasandin.

Ji bo malbatan beşdarbûna di Programa Fêrxwazîyê bêpere ye.

1. **Fêrxwazî çi ye u çarçoveya demkî ya programa me çend e?**
   Fêrxwazî „Mentoring" cûreyeke hevaltiyê ye ku tê de mezinekî dilxwaz û zarokek bi hev re wext derbas dikin. Di wê peywendiyê de kesê mezin fêrkar „Mentor*in" û zarok jî fêrxwaz „Mentee" ye. Ev cot ango tandem (Fêrxwaz û Fêrkar) heftê carekê sê heta çar saetan ji bo dema heşt mehan digehîjin hev da ku bi hev re tiştekî bikin. Fêrkar bi gelemperî zarokê hildide û paşê vedigerîne malê. Ew herdu bi hev re biryar didin ka kîjan çalakiyan bikin. Fêrkar gelek ramanan ji bo birêxistinkirina demê vala û gelek dem ji bo gohdarîkinê bi xwe re tînin. Fêrxwaz dikare gelek tiştan fêr bibe û tiştên nû yên balkêş biceribîne. Bi hev re ew tîmek baş in!

2. **Kî dibe Fêrkar?**
   Kesên ku serrast û pêbawer in, beşdarî programa fêrxwaziyê dibin. Ev jî divê bi pêşberkirina belgeya reftarê ya fermî were pejirandin. Belgeya reftarê şehadezek çapkirî ye ku îspat dike ku kesê eleqedar ne xwediyê qeyda sûcan e. Fêrxwaz ji bo xebatên xwe yên di programê de pere nagirin. Ew dixwazin di pêşveçûna zarokek de piştgirî bikin, cîhanê bi çavên zarokek ji nû ve keşif bikin û bi zarokê re li Berlînê bigerin.

3. **Erkên komeleya kein Abseits! e.V. çi ne?**
Komeleya kein Abseits! Ji sala 2011 an ve heye. Tîma me ji gelek hevkarên jin û mêr ên pispor pêk tê. Di fêrxwaziyê de gelek ezmûnên me hene û me berê li zêdetirî 500 tandeman nihêriye. Berî destpêkirina programê, em bi baldarî kontrol dikin ka kesên dilxwaz bi kêrî erka fêrxwaziyê tên an na? Em dilxwazan di kursên perwerdeyê de ji bo rola wan amade dikin. Li gorî kesayetî û berjewendiyan, Fêrxwaz û zarok ji bo ku hevûdu li hev bikin têne hilbjartin. Em bi tevahî heyamê li tandeman dinêrin û tevlî tiştên din, hev nasîn, geryanên hevbeş û hevdîtinên pevguhertinê organîze dikin. Em di têkiliyê de dimînin û her gav muxateb in ji bo pirs, pirsgirêk an pêşniyaran hemî beşdaran.

4. **Fêrxwazî çi bandorê li zarokê we dike?**
Gelek zarok di fêrxwaziyê de tiştên nû diceribînin, jêhatîbûnê pêş dixin û berjewendiyan kûr dikin. Ew ê bêtir serbixwe û xwebawer bibin, xwe bêtir hevseng û bextewer hîs bikin. Her wiha taxa xwe û Berlînê baştir nas dikin û ji bo birêxistinkirina dema xwe ya vala fikrên nû werdigirin.

5. **Çi ji dêûbavan tê hêvîkirin?**
Heke hûn dixwazin ku zarokê we di programa me de bibe fêrxwaz, girîng e ku hûn piştgiriya serkeftina fêrxwaziyê bikin. Hûn piştrast dikin ku randevû bi pêbawerî têne pêkanîn û bi fêrxwazan re bi rêkûpêk di têkiliyê de dibin. Heke randevû nikaribin werin pêkanîn, hûn an zarokê we di wextê xwe de randevû betal bikin û randevûyek alternatîf saz bikin. Heke pirsên we hebin, hûn dikarin her gav bi tîmê kein Abseits! re têkilî daynin.

kein Abseits! e.V.

Fehmarner Straße 12

13353 Berlin
info@kein-abseits.de

Telefon: 030 - 4 90 86 886

www.kein-abseits.de

instagram.com/kein_Abseits

facebook.com/keinAbseits

tiktok.com/@kein_abseits

youtube.com/keinAbseits